Kurdistan
PDK-S Partiya Demokrata Kurdistan - Sûriya 1957
Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin
Adar / 15 - 3 - 2021
Kurdistan-Hejmar (193)
www.pdk-s.com


# Çima pêngavên yekrêziyê dereng dikevin

Kurdistan **Ehmed Omer**



Ev demeke danûstandinên di navbera Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKS û Partiyên Yekîtiya Niştîmanî PYNK hatine rawestandin, ku ev yek di demekê de ye ku çavê hemû xelkê Kurdistana Sûriyê li van danûstandinan e. Mihemed Ebdula li ser vê mijarê wiha dibêje, mijara yekrêziya aliyên Kurdî li Kurdistana Sûriyê gelekî giring e, lê Partiya Yekîtiya Demoqratîk PYD astengiyan ji yekrêziyê re derdixe ew jî bi fermana hejmareke serkirdeyên PKK, divê ev yek ji xelkê Kurdistana Sûriyê were eşkere kirin ku kî berpirs e di ber astengkirina danûstandinan de. Nalîn Xelef jî wiha li ser vê mijarê dibêje, divê berî her tiştekî xalên nakok bêne eşkere kirin, her car serkirdeyên PYNK daxuyaniyên tûnd li dijî Pêşmerge dide û divê ev daxuyanî werin raweatndin daku civîn bêne berdewam kirin. Armanca serkirdeyên PYD ji her daxuyaniyeke dijê ENKS heye ku ew jî rêgirtina danûstandinan e, helbet ew sûdê jê dibîne.

# Kurdan berî hemû gelên Sûriyê serhildan li dijî rejîma Esed kirine







Kurdistan-
Hozan Ebdulrehman

Di 12ê Adara sala 2004an gelê Kurd li seranserî Kurdistana Sûriyê ji Qamişlo û herêma Cizîrê, Kobanê, Efrîn, Heleb û heta Şamê paytexta Sûriyê li dijî rêjîma Suriyê serî hildan. Heya niha jî Kurdên Rojavayê Kurdistanê wê rojê wek rojeke dîrokî û “Roja Şehîd” bibîr tînin. Di 12ê Adara sala 2004an li yarîgeha Cîhad li bajarê Qamişlo, di dema lîstika fotbolê ya di navbera her du tîmên (Cîhad û Fitiwê) de , cemawerên tîma Dêrazorê sivikatî bi al û sembolên Kurdistanê li nava yarîgehê kirin û bi dar û keviran ku berê xwe ji vê bûyerê re hatibû plankirin êrîşî cemawerên tîma Qamişlo kirin. Hêzên ewlekariya rejîma Sûriyê li şûna ku navbênkariyê bike, bi guleyan û bi fermana parêzgarê Hesekê yê wê demê Selîm Kebûl bi guleyan êrîşî cemawerên Kurd kir û di encam de hejmarek welatiyên bajêr şehîd kirin û hejmareke din jî birîndar bûn. Herwiha cemawerên Tîma Dêrazorê jî bi hilîkopteran ji nava yarîgehê ji aliyê wan hêzan hatin derxistin. Xelkê Qamişlo bi coş û hêzeke bêhempa derketin kolanan û meş û nerazîbûn nîşandan, lê hêzên rêjîma Sûriyê careke din êrîşî xelkê kir û hejmareke din ya welatiyan şehîd bûn û rewşeke tirsê di nava bajar de belav bû. Meş û xwepêşandan li dijî rejîma Sûriyê di wê demê de li Qamişlo ranewestiya û berê xwe da tevahiya bajar û bajarokên Rojavayê Kurdistanê û bi durşmên bijî Kurdistan, şehîd namirin hatin xemilandin. Herwiha bo cara yekem di dîroka rêjîma Beis de jî peykerê Serokê berê yê Sûriyê Hafiz El-Esed li bajarê Amûdê ji aliyê xwepêşanderan ve hat şikandin û ji Dêrikê heya bi Kobanî û Efrînê navend û bargehên hikûmeta Bes hatin şewtandin û jinavbirin û desthilata Beis jî li gelek bajarên Rojavayê Kurdistanê hatibû destxistin. Di serhildana 12ê Adarê de zêdetirî 40 Kurdên Kurdistana Sûriyê li çend bajarên cuda cuda şehîd bûn û bi sedan kes jî birîndar bûn. Herwiha hêzên rêjîma Sûriyê zêdetirî 3 hezar kes bi tometên cuda cuda zindanî kirin û hin ji wan bi salan di nava zindanan man, lê serhildan li wê salê ranewestiya û di sala 2011an de Kurdên wî perçeyê Kurdistanê tevlî Şoreşa Sûriyê bûn û careke din durişm û sembolên Partiya Beis anîne xwarê.

Ehmed Ebdulselam li ser serhildana sala 2004an wiha dibêje, serhildana 12ê adara sala 2004an ji bo Kurdên Kurdistana Sûriyê gelekî giring bû, û dengê Kurdan gihandine navendên navdewletî û ev yek bix we jî ji bo me wek Kurdan di wê demê de gelekî pêwîst bû, lewma ew serhildan bingehek bû ji bo şoreşa sala 2011an ku li tevahiya Sûriyê çê bû, Kurdan berya hemû gelê li Sûriyê dijîn li dijî rejîma Esed ya stemkar serhildan kirine û ti aliyek nikare muzayedê li ser Kurdan bike, Kurdan ispat ew li ser xaka Sûriyê di jê stemkariyê de dijîn û ti aliyek jî piştevaniya wan nake, ez dikarim bibêjin piraniya ewên ku niha xwe dikin opozîsyon wê demê li dijê Kurdan û şoreşa wan bû, heger wê demê hemû xelkê Sûriyê serhildan ligel Kurdan kiriba wê rejîma Sûriyê lawaz biba, lê mixabin ew yek nehat kirin û Kurd di wê demê de bi tenê man. Mihemed Eyûb jî wiha dibêje, bi rastî di wê demê de Kurd bi tenê man û ti aliyekî pişta wan negirt, û hemû jî ev pirs bi wê yekê girêdan ku qaşo bûye pirseke di navbera Kurd û Ereban û ev yek şaştiyeke mezin bû, ji ber ku pirsgirêka mezin ligel rejîma Esed bû, û Kurd li dijî stemkariya vê rejîmê ser hildan û ew serhildan kirin. Rast e bûyreke li nava lêstighea Qamişlo rû da, lê pirs ne ev bû, pirsa xelkê Kurdistana Sûriyê ew kirin destpêkek ji bo serhildana xwe ku gihiştev Şam û Helebê, helbet wê demê jî ragihandin ne wek ya niha bû, heger ewqas pêşketî ba dê bêhtir dengê xwe vedaba, û dê deng û rengê Kurdan gihiştiba tevahiya cîhanê. Divê em vê serhildanê her sal bibîr bînin û serê xwe pê bilind bikin ji ber vê serhildana erkanê rejîmê di wê demê de hejand û hişt ku ew bix we hest bike ku Kurd miletekî zindî li ser vê xakê û ti care namre.

# Ibrahîm Yûsif afrênerê peyva şêrîn



Mahir Hesen

Bi rîtma baş, bi bedewiya şêwaz û hêzek bilind , barên hestyarî hilgirtiye û xeyala bi meyla bedew û bi zêdebûna hez , li ber sînorên azmûna , û delaliya hesta dibe hustayê peyvan.
Ew nivîskarê dilnimz gelo kî ye ?!Ibrahîm Yûsif , mirovekî bi xweşgotin, lihevhatin û bi zelaliya ramanan tête nasîn. Kesayetek wêjayî serdest e di rastbûna mijaran de,û him di pêşkêşkirina ramanan de, Ibrahîm ji tevgerên kesane dûr dikeve , û ber asoyên zanastî ve diçe. Hêjayî gotinê ye ku girîngiya nivîskar Ibrahîm Yûsif ku dikare bi pênûsa xwe guherînên bi erênîbûnê çêbike, lewma bi çengek bêwest e bo rastiyê.
Ku em ji nêzîk ve binerin , em dibêjin: nefspiçûk wek sûdwergirtine û raya zanistî ya nivîskar Ibrahîm destnîşan dike, û wateya wê çi ye raya zanistî ?!ew e ku digel nêrîna wî piştgirî dide nifşê nûhatî.
Ibrahîm li ser pirsa maf û azadiya kurdan xebitiye, û her pabendî parastina nirxên civaka kurd li kurdistana Sûrî gerdûnî ye, bi raman, nivîsandin an jî bi helwestên xwe. Ew xwedî bandor e bi ramanên ku diafirîne û bi zanîna ku ew peyda dike û têkiliya ku datîne.
Jenîngeriya Ibrahîm Yûsif Romannûs û helbestvan Ibrahîm di sala 1960an de li gundê girfendî ji dayik buye , ew çar salî ferî xwendina Qurana pîroz buye. Ibrahîm Yûsif di malek niştîmanperwer de mezin buye û bi hezkirina helbestê ve hat girêdan dema bav û bapîrê wî helbestên wek mînak yên Ehmedê Xanî dixwendin. Bi çûna wî li hisiçe re bo wendina xwe navendî dest bi karê şanoyê kir him wek nivîsandin û him wek şanoger û wisa berdewam kir heya salên80 ê jî , tevî rewşa malbata wî ya darayî lewaz bû , lê Ibrahîm xwendina xwe li zanîngeha şamê beşê wêjeya erebî bi dawî kir. Rastî gelek kotekî ji alyê rêjîma sûrî ve hat biteybetî piştî çabkirina pirtûka xwe ya yekem di sala 1986an. Ibrahîm di sala 2007an koçî dewha bû lê dîsa li welat vegeriya. Her rêjîma sûrî gefên kuştin û binçav kirinê lê dikirin ku ibrahîm neçar ma û dîsa berê xwe da xerîbiyê û çû îmarat. Piştî bidawîbûna muhleta pasaporta wî nema dikarî bû li îmarat bimîne , ji lewma ber bi ewropa ve mişxet bû û li elmaniya bi cih bû. Tevî karê mamostayiyê wek rojnemavan û sernûser jî tête nasîn



Hin ji berhemên wî

Di warê helbestê de:
1 - Hezkirina ji bo goristan û dûriyê- Helbest - Damascus - 1986
2 - Helbest çawa digihîje - Helbest - Qamişlo - Pirtûkxaneya Dar Al Liwa - 1988
3 - Hawara Peyamnêrê Memalk e - Helbest - Qamişlio - weşanên Kovara Zanîn- 1992
4 - idkarat - Helbest - weşanên Dar el-yanabî' - Damascus - 1995
5 - al Rissîs - Helbest - Yekîtiya Nivîskarên Ereb li Sûriye - 2000
6 - Demjimara Damascus - nivîsar - Dar alawraq Qahîreyê - 2016
7 - bavê xwe vedigerînim - Helbest - Qahîreyê - 2016
8 - Madahat Al-Bayad - Dar Al-Qelam Al-Cedîd Beyrut - 2016
9 - Heft Bilûrên icaf - Helbest - Destnivîs - ji bo weşanê 20 amade ye
10- Atlasê Tenêtiyê - Dîwanê Malbat û Mal - Amazon

Di warê jînenîgariyê de:

1- mumhat al mesafa - Jînenîgarî - Dar al ewrqa Qahîreyê - 2016
2 - Bi vî rengî ez helbesta xwe dinivîsim: Helbestvan û Nivîsara Li Ser Roka Teoriyê - Ramanên li ser Helbestê - dar al ewraq Qahîreyê - 2017 - Li derveyî Dîwarê Mezin ê Çînê: Ji henkan bigire heya bêtaran - Rojname - Amazon 2020

Di warê çîrok û romanê de:

1 - Dara kîna baş e - berhevokek çîrokan - Dar Speris - Dihok - Kurdistan - 2004 2 - Kolana El-Hurriya ( azadiyê) - Roman - çapa yekem li Elmanya û li Dar Awraq hate weşandin - 2017 - çapa duyemîn - awraq - Qahîre 2017
3 - Şingalname - Romanek - Dar Awraq ji bo Çapkirin, Weşandin û Belavkirinê Gulan 2018
Çapa duyemîn: Amazon - destpêka 2019 Çapa sêyemîn: Awraq çapkirin, weşandin û belavkirinê Çapa çaremîn - Cezair - di çapê de .... Çapa pêncemîn: Navenda Çandî û Civakî ya Laleş - Herêma Kurdistanê - 2019 - di bin çapê de
4- komara seh - romanek - ya herî dawî hateye çape kirin - Dar Arwaq- El Qahera

Pirtûkên rexne:

1 - Dengvedanên metnê - "Li benda çapkirinê ye
2 - Helbesta nivîsara Facebook - Arwaqah ji bo Lêkolîn, Werger û Weşanê - Qahîre - 2019
3 - Bandor û Pris - Rexne - Yekîtiya Nivîskar û Nivîskarên imarat - 2016
4 - Guhertinên di nivîsa helbestkî de - Rexne - Yekîtiya Nivîskarên imarat - 2016
Lêkolîn û vekolîn:
1 - Qêrîna termê nû - Pêşbîniyên li ber devê veguherînê - Ji hêla Rojnameya El-Riyad ve hatî weşandin li Erebistana Siûdî - 2016
2- Vejandina Qabîl - Ber bi Lêkolînek Wêjeyê ya Nû ve - Dar Awraq Qahîreyê - 2017
3- Stratejîstê ZanaTaktîka Hêzê - Sê Beş - Weqfa Lêkolîn, Werger û Weşana ya Arwaq-2019
Bedewiya Tenêtiyê: Di Pirsgirêkên Tirs û Bijiyê de!
Cezaar çapa nû ya: pirtûkên nû yên dûr jêbirin?
* Ji bilî pirtûkên ku bi kesên din re hatine parve kirin .....

Ev bi kurtayî li ser keda Ibrahîm yûsif me nivîsand ku wek Rewşenbîrekî xwedî roleke mezin e, ne tenê bi berhevkirin, lêpirsîn, û kişandina agahiyan de , ew di çaksazkirina rastiya tê de dijî, bi taybetî di vê heyama demê de, di cîbicîkirina kar û barên netewî , roleke bibandor û misoger
Çimkî hewil dide ku rihê hêvî û xebatê di dilê miletê de biçîne, û piştgiriyê dide bindestan, belê ew di axavtinên xwe de, hestên xwe tawanbar û dilşikestî nake , lê di heman demê de wan bi aqilmendî, xebatek avaker û enerjiyên di xizmeta gelê kurd de digire ber xwe.

# Mela Ehmedê Palo Helbestvanekî jibîrkirî ..



Raid Mihemed



Wêje û kiltûr a her miletekî û gelekî dibe nînika wî miletî wî gelî , û yek ji Nivîskar û Wêjevanên me yên kurd ku berhemên pir Zêrîn û bi nerx ew Mela Ehmedê Palo ye ku ew bi xwe li gundê Sîracora ya girêdayî Bajarê Palo li bakurê Kurdistanê sala 1920 jidayîkbûye ji Êla Kemalî ya Zaza bû , Mela Ehmedê Palo Sêwî ma hîn zarok bû bavê wî Dayika wî oxra dawî kirin , û di wê demê de gelek êş û Azar û derd dîtin , û li cem Mamê xwe bi navê Xalid kar kir lê ji ber Eşkence û lêdanê 2 caran ji mala mamê xwe revî , û di wê demê de 2 mehan li nexweşxaneya Mêrdînê ma û di destpêka sala 1930î çû gundê wîsîkê li wir bû gavanê gund , heta sala 1936 ku hevalên wî rê danê ku xwendina xwe berdewam bike ji ber ew mirîdê Şêx Ehmedê Xiznewî bûn , ji ber wiha çû gundê Xizna li binxetê sala 1937an , li gundê Wîsîkê hevjîna xwe MEDÎNE anî û careke dî vegeriya Gundê Xizna ji bo xwendina xwe berdewam bike , mamosteyê wî yê olî şêx Izeddîn El-xiznewî bû , û ji rexê Dîrokê û neteweyê bi ser Mela Hesenê kurd diçû , û hevaltiya wî bi Helbestvan Cegerxwîn û mela Nûrî Hesarî û Mela Hesenê kurd û Seydayê Tîrêj hebû , lê hevalên wî yên nêzîk di 20 salên dawî yên jiyana wî Mamoste Ehmed Hisên Hecî hemo li cirnika Qamişlo û mamoste Ebd-elrizaq Cengo , û Haco Hecî Es'ed mela Hacî ji Cim'ayê û Nûrî Silêman Şakir Muxtarê Sêgirka , û Parêzer û Helbestvan Xelîl Mihemed Elî, D.û Helbestvan Feydella Xiznewî , Ebd-elbaqî Seyid Remezan , Mamoste Hemza Ehmed Hesen .

Helbestvan Ehmedê Palo piştî Xizna çû û li Bajarê Qamişlo niştecî bû , 4 zarokên wî yên kur çêbûn (Burhan , Ebd-elezîz , Mihemed Se'îd , Rêzan ) Û 3 keçik (Elîfa , Hedya , Hebîba )

Her wiha li gundê Xirbê Hisê bû Îmam (Pêşewa) li mizgefta gund di navbera sala 1942an heta 1959an de , û li gundê Bile Bikariya û li Amûdê di bazirganiya Pirtûkan de kar kir , û li taxa Mehete li Qamişlo weke Zêrevanî ser Gorepana Genim û Ceh kar kir , ew jî di sala 1960î de heta ku nexweş ket di destpêkê salên Heştê ji sed sala bûrî de , ji rexê Hikûmeta Sûrîya hat girtin sala 1959an ji ber guhdana wî bi wêje û nivîsandina bi zimanê kurdî, her wiha Mirîdê Şêxan lêxistin ser fikir û raman û hezrên wî yê Neteweyî ku ew di dît ku ew riya Sofîtiyê rêke Şaş e , û di riya Helbesta re êş û derdê miletê xwe da xuyakirin, di dema bihîst bi nûçeya Koça dawî ya mela Mistefa Barzanî, pir êşa û ji nûçeyê ket û bê hiş ma , û bi nexweşiyê ket , û di roja 9ê Gulana 1991ê bi temenê 71 salî Helbestvan ê kurd yê mezin koça dawî kir, û berhemekî mezin li pey xwe hişt bi taybet Dîwana Dewr û Gera Kurdistanê, û gelek ji berhemên wî winda bûn , lê yên naskirî ev in : -Birîna Neştimanî , Civîna Nemiran ku ji 10 hezar malik pêk tê ku ew dibe mezintirîn Afsaneya Cîhanî , Civîna nemiran û Şoreşa kurda , bîr û bawerî , behlewî û civîndarî , Baxê Evînî , Baxê Neştimanî .

Her wiha pirtûkek derbarê rêzimana kurdî nivîsand , û Ferhenga Kurdî-Tirkî .

Her wiha Xelatek bi navê Ehmed Palo li bajarê Qamişlo hat damezirandin , ji rexê Destana Helbestî ya Mela Ehmedê Palo ya Navdar ya bi navê " Civîna Nemiran" ku yek ji berhemên herî balkêş û mezin e di dîroka Edebiyat û wêjeya Kurdî ya klasîk de. Civîna Nemiran ji deh hezar malikan pêk tê û bi zimanekî zelal û hevgirtî û bihêz hatiye nivîsandin.

Seydayê Palo bi vê berhema xwe hewl dide berhemeke wek pirtûka fîlozof û nivîskarê navdar Ebûl Ala el Meirî ya bi navê (Rîsalet el Xufranê) li pirtûkxaneya Kurdî zêde bike.

Ji ber ( Dûrkirina çend mezinên Bedlîsê ) Palo pir xemgîn e , hestê wî yê neteweyî diherike û di vê helbestê de dibêjê :

Ji te sergûm kirin pir mela û şêx û begler

Kirin qefle , kirin bir edîb û mîr û serwer

Didane ber gem û dar berî dane Anadol

Birin bê çek sera ser di dane ber pî yû sol

Di gel bav û keçê û dê kur û ap û birader

Bi agir hin kirin kê ji cî tevde kirin der

Di gel lêdan û kuştin birçî bûn û hejarî

Li ber sator û xiştin jev kirin parî parî

Binê Sadûn û Gulşen di Asparta dinalin

Kirin hebsê , kirin ben ji çavan xwîn dimalin

Mele se'îd efendî di Aspata nexwşe

Di bê Hemdî efendî di dilda xem dinoşe

Were cem min birader navê xwe têxe lîstê

Da em hemî bera ber herin baxê buhiştê

Ji berdora were der bi min ra her binale

Binê yarê dilawer kekê te pîr û kale

Efîf kanî li kû ye şehîdê heyderanî

Xortê çeleng û nû ye wekî şêr û beranî

Xwe da kuştin ji bo me ji bona dîn û dewlet

Di da hiştin ji bo me welat û nav û rûmet

Reşîd axa di gorê nexweş û dilbirîne

Civatek dane dorê dibê qê ejnebîne

Ji nesredîn bi pirse çima tu pir dinalî
Gelo ew dil bi tirse we ya ma bê hevalî ?

Di bê ez dilbirînim ji ber doza welatê

Nexweş û mest û dînim ji ber gel û felatê

Nizanim ev çi derde tenê li ser me kare ?

Bûye zinar û perde ronî ne kar û bare

Çilo xelkê cîhanê xudî zar û zimanin ?

Berî dane jiyanê em bê hiş û nezanin

Eve ku ez dinalim nexweş û dilbirînim

Çiko bê zar û lalim bê xwendin û bê hînim

Xebat û berlemanim kitêb û tîp û name

Civîn û xwendevanim felat û çep û xame
Jêderê zaniyariyan ji pirtûka Mela Ehmedê Palo ya Nivîskar Ela-elddîn Cengo û Wergerandin ji bo Zimanê Kurdî Nivîskar Ezîz Xemcivîn.